

Plana kursê ya Perwerdeya Salmezinan ya Şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo biyaniyan

Armanca perwerdê

Perwerdeya swêdî ji bo bîyanîyan perwerdeyêke zimên ya têrzane ye û armanca wê ew e ku zanyarîyên bingehîn yên swêdî bide bîyanîyên salmezîn. Xwendevanekî ku zimanê wî yê zikmakî ne swêdî ye di vê perwerdê de wê xwe hînî pêşxistina zimanekî duyem yê fonksiyonel bike. Perwerde wê pêdivîyên zimanî ji bo danûstandin û beşdarîyêke çalak ya di jiyana rojane, civakî, kar û xwendina berdewamî bide. Herweha divê derfet ji xwendevan re bê dayîn ku stratejiyên çawa fêrbûna zimên û stretejiyên ji bo destekkirina danûstendina xwe bi pêş de bibe. Armançek din ya perwerdê ew e ku imkana fêrbûnê bide bîyanîyên salmezîn ku bingehê xwendin û nivîsandina wan tune. Şagirtek nexwende yan ku ji bilî alfabe ya latînî sistemek din ya nivîsandinê bi kar tîne dê di çarçoveya perwerdê de dersên xwendin û nivîsandinê bibîne.

Perwerde berê xwe dide kesên ku tecrûbe, rewşa jîyanê, zanîn û armancên wan yên xwendinê ji hev cuda ne. Ders bi şagird re tê pilankirin û şikildan. Ew li gor hewes, tecrûbe, zanyarîyên piralî û armancên demdirêj yên şagird tê guncandin.

Niqteya hereketê ya perwerdê pêdivîyên mirovî ne. Ew bi karê bimeaş û xebatên din wek rênasîna jîyana kar û civakî, çiraxî, praktîk û perwerdeyên din re tê kombînekirin. Lewra ji aliyê dem, cî, naverok û awayên kar de divê şeweyê wê heta ji dest tê ders guherbar be.

Armanc û taybetmendiyên perwerdê

Bi rêya Perwerda Salmezinan ya Şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan dê derfet ji şagird re bê dayîn ku van aliyên xwe bi pêş de bibe:

- şîyana xwendin û nivîsandina swêdî,
- şîyana axaftin, guhdarîkirin û guftûgokirina bi swêdî,
- şîyana fêmkirina swêdiya devkî û nivîskî,
- şîyana guncandina zimên li gor armanc, wergir û rewşan,
- bilêvkirineke baş,
- têgihîştina ku mirov çawa ziman fêr dibe,
- stratejiyên fêrbûn, xwendin û danûstendinê ji bo bi berdewamî pêşdebirina zimanê xwe,

- şîyana bikaranîna teknîka dijîtal û alavên pêwendîdar yên ji bo fêrbûn û danûstendinê, û her weha
- şayîna hayedarîya li beramberî agahîyên ji çavkanîyên cûda.

Karakterê Perwerda Salmezinan ya Şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan ew e ku xwendevan şîyana xwe ya zimanê danûstandinê pêş de bibe. Ev jî tê wê wateyê ku hem devkî, hem nivîskî li gor pêwistîyên xwe mirov bikaribe bide û bistîne. Şîyana zimên ya ragihandinê kompetensên cuda ku bi hev re têkildar in û hev temam dikin dihewîne nav xwe. Loma şîyana zimanê ragihandinê hem sîstema zimanekî hem jî zanyarîyên bê ew sîstem çawa tê bikaranîn ferz dike.

Perwerde, divê derfetan bide şagird ku ji bo pêşxistina zanîn û şîyanên xwe yên cuda û bikaranîna stratejiyan li gorî rewşeke danûstendinê ya rojane, hilibijartinên zimên yên pêwendîdar bike. Zanînen sîstema zimên tê wateya gotin, biwêj, bilêvkirin û binyata rêzimanî. Ji alîyê din ve zanînen bikaranîna zimên tê wateya ku mirov çawa nivîsekê ava dike û li gor wergir û mebestê zimanekî fonksiyonel hildibijêre û diguncîne.

Di perwerdeyê de divê şagird bi nivîsên cuda re rûbirû be ku di nav wan de peyv, wêne û deng hem bi û hem jî bê alavên dijîtalî di nav ahengekê de bi hev re didin û distînin. Perwerde divê rê veke ku şagird hişyarîya xwe ya li ser bê fêrbûna zimên bi çî rengî dibe û famkirina fêrbûna xwe bi xwe pêş de bibe. Şagird herwiha bi rêya hizirîna li tecrûbeyên xwe yên çandî, kompetensa xwe ya pirçandî pêş têxe û wan bi bûyerên rojane yên civakî, xwendin û jiyana kar li Swêdê re dide ber hev.

Perwerde divê rê veke ku şagird zanîna xwe ya bikaranîna alav û amûrên dijîtal, alav û medyayên pêwendîdar ji bo agahîgirtin, ragihandin û fêrbûnê pêş bêxe.

Struktura perwerdê

Perwerdeya Salmezinan ya Şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan ji dereceyên xwendinê, 1, 2 û 3 û ji çar kursên cuda, A, B, C û D, pêk tê. Dereceya xwendinê ya 1:ê ji kursên A, B, C û D, dereceya 2:ê ji kursên B, C û D, dereceya 3:ê ji kursên C û D pêk tên. Ew dereceyên xwendinê yên cuda berê xwe didin kesên bi paşxane, şert û armancên cuda. Ev dereceyên xwendinê nîşan dide ka kîjin kursa destpêkî û tempoya pêşveçûnê minasib e. Şagirdê di wê dereceya xwendinê û kursê de dest bi perwerdeya xwe dike ku ji bo şertên wî/wê yên şexsî herî minasib e. Mercên zanîne yên kursekê ji bo hemû dereceyên xwendinê wekî hev e.

Dereceya 1:ê bi taybetî berê xwe dide wan kesên bi xwendina pir kêr e û dereceya 3:ê ji bo wan kesan e ku xwedîyê tecrûbeyê xwendinê ne.

Nirxandina ka kîjin dereceya xwendinê ji bo şagirdê herî minasib e û divê bi kîjin ji kursên dereceya xwendinê dest pê bike pêwîst e, li ser bingehê zanebûn,

şert û tiştên din yên ji bo derfetên bicîanîna mercan lazim in, bi awayeke sîstematîk were pêşdarî kirin.

Şikildana kursên wan her sê dereceyên xwendinê li gorî tecrûbeyê fêrbûnê, paşaxana perwerdeyî û asta zanîna swêdî dema di destpêka kursê de bi awayên cuda tê kirin.

Şagirdêk dikare piştî her yek ji van kursan Perwerda Salmezînan ya Şaredariyê ya zimanên swêdî ji bo bîyanîyan bidawî bike. Lê divê derfet ji her şagirdî re bê dayîn ku hetanî kursa D ya dereceya xwendina xwe perwerdeya xwe bidomîne. Ev divê bi wê guncadina tê daxwazkirin bê kirin da ku şagird mercên zanebûnê bi cî bîne.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî

Perwerdeya fêrkirina xwendin û nivîsandinê bingehî ji bo wan kesan e ku berê perwerdeya wan nîne, kêma e yan jî ji hêla fonksiyonî ve xwendin û nivîsîna wan tune ye. Di perwerdeya salmezînan ya şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan de, bi taybetî bi dereceya xwendin 1 re imkan tê dayîn ku ew fêrî xwendin û nivîsandina bingehî bibin. Ev hûrûkûr pêdaketin û otomatkirina zanyarîyan dihewîne nav xwe. Heta mirov di bingehê de bibe xwendekê bifonksiyon demek dirêj dikare derbas bibe.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî her weha di dereceya 2 û 3 de jî ji bo şagirdên xwende lê yên ku ne bi alfabeya latînî xwendine dikare lazim be. Hingê pêvajoya fêrkirinê bi rengekî din e.

Fêrkirina xwendin û nivîsandinê ya bingehî bi kursên A-D ve nayê girêdan, ew beşeke bi serê xwe ye, ku dikare bi kursekê ve bê kombînekirin. Ev pêvajoyê heta ku xwendevan diçe perwerdeya salmezînan ya şaredariyê ya zimanê swêdî ji bo bîyanîyan dikare dewam bike, ji bo ku meharet karibe bê otomatkirin.

Fêrkirina xwendin û nivîsandina bingehî dikare bi zimanê zikmakî yê xwendevan be yan jî bi zimanekî din be, ku şagird pê dizane.

Bi rêya perwerdeya fêrbûna xwendin û nivîsandina bingehî divê ev derfet ji şagird re bêne dayîn

- pêşxistina famkirina xwe ya ka nivîs bi çi awayî peyam radighîne û ka zimên çawa hatîye afirandin
- pêşxistina şayîna xwe ya ji bo bikaranîna zimên di rewşên cuda de
- bikaranîna qaîdeyên herî asayî yên ji bo zimanê nivîskî
- bikaranîna xwendin û nivîsandinê ji bo fêrbûn, famkirin û îfadekirina xwe
- hayedarbûna ka meriv zimên çawa fêr dibe
- pêşxistina çend stratejîyên hêsan yên xwendin û nivîsandina ji bo armancên cuda, û

- bikaranîna teknîka dijîtal û alavên pêwendîdar yên ji bo fêrbûna xwendin û nivîsandinê.

Nirxandin

Niqteya hereketê ya nirxandinê dê şîyana xwendevan ya bikaranîna zimanê swêdî di armancên cuda yên di jîyana rojane, civak, kar û xwendina berdewamî de bi awayekî ku bê famkirin be. Nirxandin divê zanînen şagird li gor şertên nota Qebûlbar (Godkânt) bipêve. Şertên zanîne li gor pênc beşên zanîne hatine danîn: famkirina bihîstinê, famkirina xwendinê, danûstandina devkî, xweîfadekirina devkî û şîyana nivîskî. Ev beşên zanîne bi serê xwe cuda nayên nirxandin. Mamoste divê nirxandinek giştî ya şîyana zimanê şagird bike û binêre bê bi rastî şagird zimên çiqas dizane. Nirxandina duristîya zimanî li gor naverok û tevahîya zimên tê kirin.

Li gorî qanûna dibistanan (20 kap. 35 § skollagen (2010:800)) divê piştî dawîbûna her kursekê not bê dayîn. Di perwerda beşê fêrbûna nivîsandin û xwendinê de not nînin.

Şertên zanîne

Kurs A

Şertê zanîne ji bo notê Qebûlbar (Godkânt)

Famkirina bihîstinê

Şagird bi alîkarî gotinên zelal û hêsan yên di rewşên berbiçav yên jîyana rojane de fam dike. Şagird gotin û biwêjên hêsan û asayî yên di vegotinên bûyerên rojane de pir rûdidin fam dike. Şagird agahiyên guncandî û zelal û dîrektîfên devkî yên hêsan û ku pir rûdidin fam dike.

Famkirina xwendinê

Şagird dikare agahiyên hêsan yên ji rewşên jîyana rojane yên berbiçav bixwîne û fam bike. Şagird agahiyên di şeweyê gotin û nîşanên asayî, frazên gelekî hêsan û nivîsên guncandî û gelekî hêsan yên li ser mijareke başnaskirî dixwîne û fam dike.

Danûstendina devkî

Şagird dikare di rewşên berbiçav û rojane de bi destek danûstendinan bike. Şagird beşdarî sohbetên pir hêsan yên rojane dibe. Şagird di sohbetan de peyvên hêsan, û frazên silavdan, rêzgirtin û xatirxwestinê bikar tîne. Pirs û bersivên hêsan yên derbarê pêwîstiyên berbiçav dike.

Xweîfadekirina devkî

Şagird di rewşên berbiçav û jiyana rojane de bi alîkarî û zimanekî hêsan danûstendinê dike. Şagird bi peyv û biwêjên hêsan û asayî behsa rewş û tecrûbeyên şexsî dike.

Zanebûnên nivîskî

Şagird di rewşên berbiçav û rojane de bi peyv û sembolên hêsan agahiyên şexsî dinivîsîne. Şagird li gor pêwîstiyên berbiçav piraniya caran bi awayeke bikêrhatî agahiyên girîng jê dinivîsîne.

Kurs B

Şertê zanîne ji bo notê Qebûlbar (Godkânt)

Famkirina bihîstinê

Şagird axavtinên zelal û hêsan yên di rewşên asayî di jiyana rojane de fam dike. Şagird vegotinên kurt yên bûyer, guftûgo, agahî û nûçeyên adaptekirî yên li ser mijarên nas fam dike. Şagird peyam û dîrektîfên devkî yên kurt û zelal fam dike.

Famkirina xwendinê

Şagird nivîsên hêsan yên li derbarê rewşên asayî yên jiyana rojane dixwîne û fam dike. Şagird nivîsên adaptekirî yên saloxdanê û tarîfkirinê yên derbarê mijarên nas, agahiyên berbiçav û peyam û dîrektîfên kurt, zelal û hêsan dixwîne û fam dike.

Danûstendina devkî

Şagird bi alîkarî dikare di rewşên asayî yên jiyana rojane de danûstandinan bike. Şagird beşdarî sohbetên hêsan yên li ser mijarên gelekî nas dibe. Di sohbetan de îdiayan dike û reaksiyonan li ser îdia, hizir û daxwazan nîşan dide, û pirs û bersivên ku sohbetê heta radeyekê zindî dihêlin dike.

Xweîfadekirina devkî

Şagird di rewşên asayî yên jiyana rojane de bi alîkarî û zimanekî hêsan danûstendinê dike. Şagird bi şiklên hêsan behsa tecrûbeyên şexsî û kes, cîh û bûyerên başnaskirî dike. Şagird bi awayeke fêhmbar û hetanî radeyekê bi hevdu ve girêdayî xwe îfade dike.

Zanebûnên nivîskî

Şagird ji bo di rewşên asayî yên jiyana rojane de danûstendinê bike nivîsên hêsan dinivîsîne. Şagird peyam, silav û nivîsên hêsan li ser xwe û bûyerên ku rûdane bi zimanek fêhmbar û bi kurtî dinivîse. Şagird piranîya caran di nivîsên xwe de hevahengiyeke bikêrhatî diafirîne.

Kurs C

Şertê zanînê ji bo notê Qebûlbar (Godkânt)

Famkirina bihîstinê

Şagird axaftinên hêsan yên di rewşên asayî yên di jiyana rojane, civak, perwerde û kar de bi awayeke zelal fam dike. Şagird bûyerên ji nû ve vegotî, danasîn, guftûgo, agahî û nûçeyên kurt yên li ser mijarên nas fam dike. Şagird peyam û dîrektîfên devkî yên hêsan û zelal fam dike.

Famkirina xwendinê

Şagird nivîsên hêsan yên di rewşên asayî yên di jiyana rojane, civak, perwerde û kar de dixwîne û fam dike. Şagird nivîsên kurt yên saloxdan û danasînê yên li ser mijarên nas, nivîs, tablo û dîyagramên hêsan dixwîne û derbarê agahiyan de mînaqêşeyên hêsan dike. Şagird dîrektîf û peyrewnameyên kurt û zelal dixwîne û fam dike.

Danûstendina devkî

Şagird piştî hîn adaptekirinên armancê û alîyê têkildar bi zimanekî hêsan dikare di rewşên asayî yên di jiyana rojane, civakî, perwerdeyî û kar de pêwendiyê deyne. Şagird beşdarî sohbet û gotûbêjên hêsan yên li ser mijarên nas dibe. Di sohbetan de bersiv û pirsên li derbarê nêrîn, fikir û agahiyên ku sohbet û gotûbêjan heta radeyekê zindî dihêlin û pêş de dibin dike.

Xweîfadekirina devkî

Şagird di rewşên asayî yên rojane, civakî, perwerdeyî û kar de bi zimanekî hêsan û piştî hîn guncandinên li gor armanc û wergir danûstendinê dike. Şagird bi şikleke hêsan tewsîr û vegotinên tecrûbeyên şexsî û nêrînên li ser mijarên nas pêşkêş dike û şîret û dîrektîfên hêsan dide. Şagird xwe bi awayeke fêhbar û heta radeyekê hevîrtî îfade dike û hîn varyasyonên zimanî bikar tîne.

Zanebûnên nivîskî

Şagird bi hîn guncandinên li gor armanc û wergir, bi armanca di rewşên asayî yên di jiyana rojane, civak, perwerdeyî û kar de danûstendinê bike nivîsên hêsan dinivîsîne. Şagird bi awayeke hevîrtî û fêhbar nivîsên vegotinî û tewsîrî yên li ser tecrûbe, întîba û fikran û nivîsên agahdarkirî yên li ser mijarên naskirî dinivîsîne. Şagird piraniya caran struktureke bikêrhatî di nivîsên xwe de diafirîne û di xezîneya gotinan û avakirina hevokan de hîn varyasyon nîşan dide.

Kurs D

Şertê zanîne ji bo notê Qebûlbar (Godkânt)

Famkirina bihîstinê

Şagird axavtinên di rewşên neresmî û hin resmî di jîyana rojane, civak, perwerde û kar de bi awayeke zelal fam dike. Şagird vegotin, danasîn, guftûgo, nîqaş, agahî û nûçeyên li derbarê mijarên nas fam dike. Şagird peyam û dîrektîfên devkî yên bi detay û zelal fam dike.

Famkirina xwendinê

Şagird nivîsên hêsan di rewşên neresmî û hin resmî yên di jiyana rojane, civak, perwerde û kar de dixwîne û fam dike. Şagird nivîsên saloxdan, danasîn, delîl nîşandêr û bi argument yên li ser mijarên nas, nivîsên agahdar, tablo û dîyagram dixwîne û fam dike, û derbarê agahiyan de mînaqêşeyên hêsan dike. Şagird dîrektîf û peyrewnameyên zelal dixwîne û fam dike.

Danûstendina devkî

Şagird piştî hîn adaptekirinên armanc û aliyên têkildar hem di rewşên nefermî, hem hin fermî yên jîyana rojane, civakî, perwerdeyî û kar de danûstendinê dike. Şagird beşdarî sohbet û gotûbêjên li ser mijarên nas dibe û fikran bi argûmentên hêsan dide pêş û dibersivîne. Şagird fikr û agahiyên ku heta radeyekê sohbetê pêş de dibin pêşkêş dike û daxwaz dike.

Xweîfadekirina devkî

Şagird piştî guncandina li gor armanc û wergir bi zîmanekî hêsan hem di rewşên nefermî, hem hin fermî yên di rewşên asayî yên rojane, civakî, perwerdeyî û kar de danûstendinan dike. Şagird bi şikleki hêsan danasîn, bahs û îzaha bûyerên di rojevê de, tecrûbe, întîba û fikiran dike û şîret û dîrektîfan dide. Şagird bi awayeke fêhmbar, bi hin herikbarî û heta radeyekê hevgirtî xwe îfade dike û hîn varyasyonên zîmanî bikar tîne.

Zanebûnên nivîskî

Şagird piştî hin guncandina li gor armanc û wergir nivîsên hêsan dinivîsîne, ji bo ku di rewşên hem nefermî û hem hin fermî yên rojane, civakî, perwerdeyî û kar de danûstendinan bike. Şagird bi hin herikbarî, nivîsên bi vegotinên hevgirtî û fêhmbar, danasîn, îzahkirî û bi argument li ser mijarên naskirî dinivîsîne. Şagird di nivîsên xwe de piraniya çaran struktureke bikêrhatî ava dike û heta radeyekê varyasyoneke xezîneya gotinan û avakirina hevokan nîşan dide. Şagird di nivîsên xwe de heta radeyekê ji xwe bawer strukturek rêzimanî ya hêsan û pêşketî ava dike.